Formular leeren

Kurdisch (Kurmandschi)

Hûrgiliyên têkilî û peywendiya bi dbistanê ra

Dêbavên hêja, serperestên qanûnî yên rêzdar,

em wek dibistan dixwazin ku zarokê we di demê da û bi awayê giştalî di rênimûniya şixulî da piştgirî bikin. Wek têketina (dubare) bo vê mijarê em ji bo xwendevanên pola perwerdehiyê ya heftem û dibistana taybet a teknîkî û pêşeyî Grundbildung (Plus) an jî analîz û şiroveya şiyanên potensiyel raber dikin. Çaverêtî heye ku ev analîz û şiroveya şiyanên potensiyel, zarokê we ji bo vedîtina feraset, meraq, alîgirî û şiyanên xwe han bide.

- **Kî analîz û şiroveya şiyanên potensiyek pêk tîne?**
  Karmendên enstîtûyeke cihênera bernameyê ku bi awayekî taybet hatine fêrkirin, Analîz û şiroveya şiyanên potensiyel pêk tînin.
- **Analîz û şiroveya şiyanên potensiyel li ku bi cih tê?**
  Analîz û şiroveya şiyanên potensiyel bi giştî li derveyî dibstanê li enstîtûyeke cihênera bernameyê bicih tê.
- **Analîz û şirove çiqasî dem dibe?**
  Analîz û şiroveya şiyanên potensiyel bi hesibandina demên bêhnvedanê derdora şeş saetan dem dibe.
- **Çi karek tê kirin?**
  Spartek û ezmûnên pratîkî ku ji bo koma temenî gellekî guncan in, ji bo vedîtina şiyan, nêrîn, meyl û meraq û karayîyên potensiyel kêrhatî ne. Xwendevan bi awayê takekesî û komkî dixebitin. Ew têkildarî vê mijarê ku çawa mijûlî van spartekan dibin, wan çareser dikin û bi hev ra dixebitin, dikevin bin çavdêriyê. Di dawiya Analîz û şiroveya şiyanên potensiyel da, xwendevan bawernameyekê werdigirin. Di heyama 14 rojan da civîneke gotûbêja nirxandina bi hûrgilî ya derdora nîv saetî ji aliyê enstîtûya cihênera bernameyê va, eger bixwazin her wiha bi beşdariya dêbavan tê lidarxistin. Di vêcivînê da encamên xwendevanan bi awayê kesane ji bo wan tên şirovekirin û bi awayê profîla xalên wan ên hêz û şiyanê radestî wan tê kirin. Profîla xalên hêz û şiyanê li dibistanên navîn ên Perwerdehiya Gelemperî li peldanka „Berufswahlpass“ (Destûra Bijartina Şixulê) ku bi awayê taybet jib o rênimûnîya şixulînê hatiye raberkirin, tê arşîvkirin û bi rêya belgeyên din tê kemilandin. Ev profîl bingeh û esasa plandarêştina hînbûn an piştevanîya kesane pêk tîne.

Analîz û şiroveya şiyanên potensiyel pêk tê

di roja _____

saet di .. da _____Heta _____ Saet

li _____.

(Navê enstîtûya cihênera bernameyê)

Ji kerema xwe vê rûpelê heta roja ∟∟.∟∟.∟∟∟∟ bi awayê wajokirî dîsan li dibistanê vegerîne.

Zanyariyên têkildarî pêkanîna Analîz û şiroveya şiyanên potensiyel:

Hefteya rojhejmêrî/Heyama demê: _____

Raberker/Enstîtûya cihênera bernameyê: _____

(Nav û navnîşan) _____

Navê berpirsê bersivdêr: _____

Razîname ji bo zarokên xwarê ji bo beşdariya di Analîz û şiroveya şiyanên potensiyel da:

_____

Paşnav, nav, Pol

_____

Wajoya dêûbav an yek ji dêbavan/serperestên qanûnî (di rewşa gihîştina bo temenê qanûnî wajoya xwendevan bixwe)

Têbînî: Razînebûn dûhatên nerênî ji bo zarokê we bi xwe ra nayîne. Razînameya raberkirî dikarin bêyî dûhatên nerênî bi rêya şandina name an Emailê bo dibistanê betal bikin. Di rewşa paşvekişandina razîbûna ji bo zarokê têkildar da hemî qonaxên din di Analîz û şiroveya şiyanên potensiyel da ji dema wergirtina rezamendiya herî dawî dê werin jêbirin.

Ez/em di çarçoveya Analîz û şiroveya şiyanên potensiyel da

❑ **têkildarî qanûnên parastina daneyan vê yekê dipejirînim/dipejirînin ku**

❑ **têkildarî qanûnên parastina daneyan vê mijarê napejirînim/napejirînin**

(ji kerema xwe nîşandar bike)

- daneyên xwendevaniyê yên vî zarokî (paşnav, nav û dibistan) bikevin ber destê enstîtûya cihênera bernameyê ku navê wê li nameya dêûbavan ji bo cihanîna Analîz û şiroveya şiyanên potensiyel da hatiye birin
- daneyên nivîsandî (dîtinî û şopandinên xwendevanan) ji aliyê enstîtûya cihênera bernameyê ku navê wê di nameya dêûbavan ji bo cihanîna Analîz û şiroveya şiyanên potensiyel da hatiye birin, werin berhevkirin û pêvajokirin
- daneyên xwendevaniyê yên vî zarokî jibo armancên safîkirina hesabê Analîz û şiroveya şiyanên potensiyel bikevin ber destê Ofîsa projeya Analîz û şiroveya şiyanên potensiyel a Brandênbûrgê.
- profîla Xalên hêz û şiyanê yên vî zarokî ji aliyê enstîtûya cihênera bernameyê va ji bo şêwirîna zêdetir di pêvajoya rênimûnîya şixulînê bikevin ber destê mamoste û ji bo darêştin û amadekirina bernameyên hînbûn û pêşketinê bo zarokê min werin bikaranîn.

Ez/em di babetên xwarê da hatime/hatine haydarkirn:

Dêûbav an serperestên qanûnî dikarin beşdarî civîna gotûbêja nirxandinê ya dawî ku derdem piştî pêkhatina Analîz û şiroveya şiyanên potensiyel da tê lidarxistin bibin. Enstîtûya cihênera bernameyê ya navbirî encamên Analîz û şiroveya şiyanên potensiyel di profîleke xalên hêz û şiyanê da ku di civîna gotûbêja nirxandinê radestî zarok tê kirin, şirove dike. Zarok ji bo pêvajokirin û nirxandina zêdetir dê peldanekek taybet yanî Destûra Bijartina Şixul ji dibistanê wergire ku tê da belgeyên pêkhatî ji pêvajoya ber bi pêşketinê ya rênimûniya şixulî ji bo belgewarkirinê tê arşîvkirin. Destûra Bijartina Şixulê ji bo zarok hertim destragihîştî ye. Dîtina Destûra Bijartina Şixulê ji bo dêûbav ann serperestên qanûnî di her demekê da pêkan e. Nihênîbûna daneyên Destûra Bijartina Şixul di dema bikaranîna wê li dibistanê hatiye misogerkirin.

Profîla xalên hêz û şiyanê, her wiha daneyên li gorî profîla xalên hêzê herî zêde du hefteyabn piştî bidawîhatina civîna gotûbêja nirxandinê ji aliyê enstîtûya cihênera bernameyê va tên jêbirin. Veguhestina bo aliyên sêyem li derveyî dibistanê (wek mînak odeyên kar û pêşeyan, ajansên kar an navendên din) pêk nayê.

Razînameya têkildarî qanûnên parastina daneyan dikare di her demekê da bêyî hebûna dûhatên nerênî bi rêya name an Email'ê bo dibistanê were betalkirin. Di vê rewşê da beşdariya xwendevan di Analîz û şiroveya şiyanên potensiyel da bi nasnavê pêk tê. Di wê rewşê da profîla xalên hêz û şiyanê jî bi nasnavê tê çêkirin.

Cih, dem

Wajo/wajoyên dêbav an serperestên qanûnî
(di rewşa ku xwendevan gihîştibe temenê qanûnî, bi wajoya xwendevan)